

Aşîkirin/vaksînkirin dijî enfluensayê

Tu dixwazî xwe ji enfluensaya giran û rîska nexweşeyên li pey wê rizgar bikî? Ma tu ji grûpekê yî ku rîska tûşbûnê pê re ye? Ma temenê te ji 65 salan mezintir e? Hingî divê tu xwe aşî bikî/vaksîn bikî berî ku vîrusa enfluensayê ya îsal bigehe Belkingeyê. Ev aşî/vaksîn te ji enfluensaya giran, ya ku dibe sedema nexweşeyên dijwar yên ku pey wê re tên, wek kulbûna pişikê/sihê, diparêze.

Enfluenta ji vîrusê peyda dibe û gelek vegir e. Vîrus bi rêya hewayî nexweşiyê vediguhêze û nexweşî li pêşya her tiştî tê belav kirin heger kesê nexweş bikuxe yan bipişike/bibihniye. Ev nexweşî di nîvsala zivistanê de li Swêdê belav e. Ji enfluensaya belav re enfluensaya demsalê jî tê gotin.

Mimkin e hin kes bi dijwarî nexweş bibin

Rîsk heye ku enfluenta te bi dijwarî nexweş bike heger tu di dereceya pêşîn de pîr bî yan ji grûpekê bî ku rîska tûşbûnê pê re heye. Teqrîben hemû kesên ku bi enfluensayê dimirin ew in yên ku temenê wan ji 65 salan mezintir e yan xwedî nexweşiyeka birîsk ya din in. Lewre, tewsiye tê kirin ku ji her kesî pêştir grûpên xwedîrîsk û kesên bitemen her sal xwe aşî/vaksîn bikin.

Tu ji grûpên birîsk î heger

- tu ji 65 salan mezintir bî
- nexweşiyeka te ya dil yan pişikê/sihê hebe
- êşa şekirê ya bi dereceyên bilind yên şekira xwînê bi te re hebe û tedawiya wê zor be
- rêlibergirtina enfeksiyonê li ba te ji ber sedemeka din daketî be
- nexweşiyeka kezeb yan gurçikê ya domdar li te hebe
- tu zêde qelew bî
- nexweşiyeka reh-masûlkî ya ku tesîrê li bêhnstendinûberdanê dike bi te re be
- tu hamîle bî û di nîva dawîya ya hamîlebûnê de bî
- tu zarok bî û pirseqetî bî.

Aşîkirin/Vaksînkirin

Piraniya ku xwe aşî dikin ji enfluensayê rizgar dibin. Heger tu pê nexweş bibî jî, aşî/vaksîn nîşanên wê sivik dike û tu bi qasî ku tu nehatibûyîya aşî kirin nexweş nabî.

Piraniya aşiyên/vaksînên dijî enfluensayê ji hêka mirîşkê hatine çêkirin. Berî aşîkirinê/vaksînkirinê, divê tu hertim bi doktorekî bişewirî heger tu li hember hêka mirîşkê alerjîk/hesas bî.

Aşîkirin/vaksînkirin weha dibe

Tu dê carekê li dijî enfluensayê bêyî aşî kirin û aşîkirin sala paştir tê dubare kirin. Adet e ku derzî li jormilê te bê xistin. Ji bo wextveqetandinê, peywendiyê bi navenda xwe ya lînerînê bike.

Mimkin e cihê derziyê piştî aşîkirinê piçek sor bibe û biwerime û mimkin e hestkirin bi piçek germiyê jî pê re hebe. Carinan mimkin e ta/germahî te bigire. Adeten ev nerehetî di çend rojan de namînin.

Biha

Bihayê aşîkirinê/vakînkirinê 340 kron e. Ew belaş e heger te 65-salî bî.

